ZANEBÛNA BİNGEHÎN |
Hepatît

STOPHEP
Agahdarî
BI HEV RA, HEPATÎT C'YÊ JÎ HOLE RAKIN



Kurdisch

Zanebûn diparêze:
Tendûrîstîya Kezebê û Hepatît C

MiMi Das Gesundheitsprojekt Mit Migranten für Migranten

Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.

Jîyanek bi tendûrîstî! 3

Çi pêywendîya hepatît C'yê bi min ra heye? 3

Taybetîya hepatît C'yê çi ye? 4

Kezeb: Organeke piralî ku pêdivîya wê,
bi parastina girîng heye 5

Ji ber çi kezeb nexweş dibe? 6

Hepatît C: Ger kezeb nêm bigre 7

Nexweşîya hepatît C çawa xuya dibe? 8

Şevba (Virûsa) hepatît C çawa tê veguhastin? 9

Xetera enfeksîyonê kêm bikin 10

Teşxîs û derfetên testê 11

Pêşandana belaş ya hepatit,
di kontrola tendûristîyê da 13

Tedawîya hepatît C 14

Agahdarîyên din û alîkarî 15

Berpirsîyarîya belavokê 16

Jîyanek bi tendûrîstî!

Li seranserê cîhanê her roj, ji ber nexweşîya hepatîtê 3.000 kes jîyana xwe ji dest didin. Hepatît C, yek ji sedemên sereke yên sîroza kezebê û penceşêra kezebê ye.

Lê belê, ger enfeksîyon zû bête tespît kirin, di pir rewşan da hepatît C dikare bi tevahî bête tedawî kirin. Ji ber ku rêyên veguhastina hepatît C, ji hêla civakî ve hatîye stîgmatîzekirin û ji bo demek dirêj enfeksîyon dikare asîmptomatîkî be, gelek ji wan kesên ku bandor bûne, nizanin ku ew pêketî ne. Li vir, testa hêsan ya xwînê dikare teqezîyekê peyda bike.

Kesên ku di derbarê testê û vebijarkên tedawîkirinê alîkarîyê digerin, li muayenexana bijîşka malbatê, li ser xetera enfeksîyona xwe, têne agahdar kirin.

Dema çûyîna muayenexana bijîşkê, sedema tirsê nîn e. Ger kesên ku bandor bûne, bi zûtir bêtin agahdar kirin, test kirin û bête tedawî kirin, enfeksîyonên hepatît C dikare bi tevahî, bête derman kirin. Armanca vê broşüre ev e, ku li ser hepatît C bibe alîkar.

Çi pêywendîya hepatît C'yê bi min ra heye?

- Li gel ku haya min ji tu ji xeterê tune be jî, sedem heye ku ez bi nexweşîya hepatît C'yê pêkevim.
- Dibe ku encamên xerab ên demdirêj hebe.
- Niha derfetên baş yên başbûnê tedawîyeka bi bandor û hêsan heye.
- Test hêsan û belaş e.
- Di fersendeke din da ji bo ewlehîyê testa min tê kirin!

Taybetîya hepatît C'yê çi ye?

- Gelek caran bi hepatît C nahesin, lê piştî bi dehan salan, ew dikare bibe sedema nexweşîyên giran û heta rê li ber mirinê jî veke.
- Li herêmên cuda cuda yên cîhanê, dîroka rêya pêvedanê û pir carî, ji hev cudatir in.
- Enfeksîyon dikare ji mêj ve hebe û sedemên wî yên ecêb hebe: Gelek caran ew kes nizane, ku ew ji ber nexweşîya hepatît C, di bin xeterek mezin da ye.
- Perspektîfên saxbûnê, di van salên dawî da gelek baştir bûne û îro jî pir baş in.
- Perwerde, test û tedawîkirin, dikarin jîyanê xilas bikin!

Baştir e bête zanin:

Enstîtuya Robert Koch, texmîn dike ku di welatên pêştaçûyî da, ji sedî 70 ta 85 ji kêmxebata kezebê ya kronîk û sedî 60 ji tumorên şaneyên kezebê (kansera kezebê, Hepatocellular Carcinom-HCC), sedemên nexweşîya kronîk ya hepatît C ye. Hepatît C, sedî 63 ji hemû veguhastinên kezebê ya li Ewrupayê wekî sedem têtе destnîşan kirin.

Bi taybetî, ji ber vê yekê perwerdehîya li ser hepatît C'yê girîng e: nexweşî çiqas zûtirîn bête tesbîtkirin, şansê tedawîyê wê mezintir be.

Kezeb: Organeke piralî ku pêdivîya wê, bi parastina girîng heye

Kezeb, organa herî girîng a metabolîk ya laş e: Ew, beşdarê bi qasî 500 pêvajoyên metabolîk dibe. Gelek karên girîng, kezebê neçar dike. Berovajî dil û gurçikan, ew, bi amûrên teknîkî nayê guhertin. Ger kezeb nexweş bibe, ev dibe sedema astengîyên tendûristî yên mezin. Ji ber vê yekê girîng e, ku pêşî li ber zerar girtinê bête girtin.

Karên sereke yên kezebê ev in:



Detoksîfîkasyon: Kezeb, madeyên bi zirar, wek alkol, nîkotîn û her weha dermanan ji xwînê parzûn dike û wan vediguhezîne madeyên bê zirar. Paşê ewana, bi rêya gû û mîzê tên avêtin.



Metabolîzm: Kezeb, ji xwarinê, blokên avahîsazîya proteyînan diguherîne, da ku bi vî awayî ji wan enerjî bête wergirtin. Ava ziravê, ku di kezebê da tê hilberandin, ji bo helandin û mijandina rûn û vîtamînan pêwîst e.



Cîhê hilanînê: Kezeb, dikare şekir, vîtamîn û hêmanên şopê yên wekî hesin, sifar, manganez û çinko depo bike. Ger pêwîst be, wana bi careka dinê li laş vedigerîne.




Perçebûn û avabûna xwînê: Di kezebê da şaneyên xwînê yên kevin têne şikandin û proteyînên cûrbicûr yên ku ji bo girtina xwînê pewîst in, têne hilberandin.

Ji ber çi kezeb nexweş dibe?

Nexweşîya kezebê, yek ji mezintirîn pirsgirêkên tendûristîyê yên cîhanê ye. Bi tenê li Elmanyayê, zêdetirî 5 mîlyon kes, bi encamên wê ra girêdayî, bi nexweşîya kezebê ya akût an kronîk bi bandor in.

Baş karnekirina kezebê, ji ber enfeksîyon, madeyên bi zirar (mînak: alkol, derman, nîkotîn) û ji birîndarbûnê pêk tên. Bi gelemperî kêmgirtina kezebê, bi gelemperî li jêr hatine binav kirin:

- Enfeksîyonên vîral (ji ber şevbayên hepatît A, B, C, D an E)
- Enfeksîyonên ne vîral (bakterî, parazît û/an kivark)
- Nexweşîyên otoîmmunê (mînak: hepatîta otoîmmune)
- Nêmgirtina rêya ziravê



Tiştê baş ev e, ku kezeb heta astekê dikare bi xwe xwe qenc û nû bike. Lê belê, ew dikare ji hêla jîyanek ne tendûrist an bi stresek berdewam, bi awayekî cidî zirarê bibîne.

Nexweşîyên kezebê yên weke enfeksîyona bi şevba (vîrûsa) hepatît C (HCV) gelek caran dibe sedema gazincên giştî yan jî bi tenê gilîyên giştî yên weke bêhalî, windabûna performansê an jî hesta zextê di alîyê rastê ya jora zik da. Ji bo kezebeke bi tendûrist, naskirina vana, gava yekem e.

Hepatît C: Ger kezeb nêm bigre

Hepatît C, nêmgirtina kezebê ye, ku ji ber şevba (vîrûsa) hepatît C çêdibe.

Ger enfeksîyona bi hepatît C, ji ber xwe baş nebe û ji şeş mehan dirêjtir bikşîne, jê ra hepatît C a kronîk tête gotin. Ev tê wê wateyê ku kezeb berdewam bi kêm e.
Ev ji sedî 60 heta 85, di hemû enfeksîyonên şevba (vîrûsa) hepatît C da heye. Nêzîkî 58 milyon kes li cîhanê, bi awayekî kronîk bi hepatît C pêketine, li Ewrupayê jî li dora 12,5 milyon kes.

Ger hepatît C a kronîk neyê tedawî kirin, dikare bibe sedema birînbûna kezebê (fîbroza kezebê) û di encamê da kezeb piçûk dibe (sîroza kezebê). Ji ber birîndarbûna tewnê û tengbûnê, kezeb êdî nikare bi temamî karên xwe bi rêve bibe. Him piçûkbûna kezebê û him jî encamên wekî penceşêra kezebê, dikare bibe sedema mirinê.

Baştir e bête zanin:

Hepatîta kronik C, dikare bandorê li ser organ û tevnên din jî bike. Ev yek bi şêweyê nexweşîyên çav, nebaşîya gurçikê, nexweşîyên noropsîyatrîk, fibroza pulmoner (pişikê), nexweşîyên çerm, disfonksîyona tîroîd, nexweşîyên dil û reh û metabolîk, xwe nîşan dide.

Nexweşîya hepatît C çawa xuya dibe?

Ger êş û azar di wextê da bête nas kirin, nexweşî dikare bête tedawî kirin û bi zû baş bibe. Ji ber vê yekê perwerdekirina gel pir girîng e. Bi taybetî, ewên li jêr, di xeterê da nin:

- Kesên ku madeyên hişbir bikar tînin
- Kesên di zindanê nin
- Kesên ji herêmên ku pir caran hepatît lê zêde belav dibin, wek herêma Rojhilata Derya Sipî, Ewrupa Rojhilat, her wehat Afrîka, Asya Navîn û Asya Rojhilat.
- Kesên ku berîya hilberên veguhastinek xwînê wergirtine, ji bo hepatît C, bi awayeke rûtîn hatine test kirin (li Almanyayê ji sala 1991ê pê ve).

Kesên ku bi gelemperî di demek dûr û dirêj, bê êş û azar bi awayekî kronîk, di bin bandora hepatît C da bin, an jî bi gelemperî tenê nîşanên nexweşîyên li jêr nişan didin:

- Mandîbûn
- Kêm performans û mandîbûna laşî
- Gazincên ji navikên jortir
- Êşa movikan
- Zeîfbûn/qelewbûn
- Dijwarîya konsantrasyonê

Ger gazinc berdewam bikin, divê ji bijîşkan şîret bête wergirtin. Muayeneyên pêşîlêgirtinê yên ku ji hêla bîmeya tendûristîya zagonî ve tête pêşkêş kirin, ji bo zûtir tespîtkirinê dibe alîkar.

Bi pirsnameya ji bo "Kontrolkirina Kezebê" ya Navenda Bijîşkî ya Zanîngeha Schleswig-Holstein, hûn dikarin bi xwe xetera nexweşîya kezebê binirxînin. Bê guman, testek weha tenê wekî rêberîyek xizmet dike û nikare şûna şêwirdarîyek bijîjkî bigre. Hûn dikarin li ser înternetê pirsnameyê bibînin:
www.ndr.de/ratgeber/gesundheit/Test-Wie-gesund-ist-Ihre-Leber,quiz14778.html



Şevba (Virûsa) hepatît C çawa tê veguhastin?

Şevba (Virûsa) hepatît C, bi bingehî bi rêya têkilîya xwînê bi xwîn ra (car caran bê zanebûn) pêktê. Ger xwîneke pir kêm enfektekirî, ku li ber çavan ne dîyar e, têkilîya bi xwîna mirovekî ne enfekte bibe, tev li tevgera xwîna wî mirovî bibê, ew bes e.

Şevba (Virûsa) hepatît C, bi şîrê dayikê, xwarina bi hev ra, vexwarin an jî têkilîyên civakî nayê veguhastin. Mirov dikare bi awayekî ewlehî, kelûpel, kevçî-çetel, serşo, tuwalet û nivînan, bi kesek pêgirtî ra parve bike.

Şevba (Virûsa) hepatît C û rêyên veguhastinê, cara ewil di dawîya salên 1980'î da hat kifşkirinê. Berîya wê, ew, bê zanebûn belav dibû, wek mînak: Kesên ku bi rêya derzîyan an jî ji bêfila xwe madêyên hişbir werdigirtin.

Veguhastin, di pergela tendûristîyê da jî pêkdihat. Mînak, di dema zayin û emelîyatê da an jî bi rêya veguhastina xwînê ya ku di çarçoveya kampanyayên tendûristîyê yên giştî çêdibûn. Mînak: Di salên 1950 – 1980an li Misirê da, bi tedawîkirina şînstozomîyazîs pêkhat.

Ji ber vê yeke, dibe ku mirov bêyî ku pê haydar bibe, ji mêj ve bi hepatît C pêketibe, an jî ew bi cîbicîkirina testekê hatibe tespîtkirin.

Bi stigmatîzasyonkirirna bi karanîna madeyên hişbir ra girêdayî, li hepatît C belav bûye û di pergala lênihêrîna tendûristîyê da, car caran enfeksîyonê jî kirîye mijarek tabu. Ev sedemeke din e ku gelek caran enfeksîyon nehatîye tespîtkirinê.

Çîrokek kesane

Zilamekî temen 35 salî ji Rûsyayê, ev 15 sal in ku li Almanyayê dijî. Di salên destpêkê da ji bo wî dijwar bû, ku di welateke nû da bi cih bibe, rêya xwe bibîne û tev li klîkên cuda cuda bû.

Ji bo wî ev dem, demek tevlihev ya guhartinên perwerdehî û nişteçîbûnê, vexwarina alkolê, rîtuelên mêranî û zexta heval û hogiran bû. Niha ew ji mêj ve hemû tişt li pey xwe hiştîye û dixwaze jîyana xwe ya bi rêkûpêk û ewlekarî sûd werbigire.

Ew dudilî dibe, dema ku bijîşk di kontrolê da jê dipirse, gelo ew qet mada hişbir bikar anîye an na. Ew jî êdî baş nizane, gelo ew wê demê beşdar bûye an bi tenê li wir bûye. Ew xemgîn dibe û difikire ger ew bêje, êdî kes rêzdarî nîşan wî nedin. Li ser pirsa rasterast ya bijîşkê û her weha sedema pirskirinê jê ra dîyar kir, ew jê ra alîkar bû.

Xetera enfeksîyonê kêm bikin

Ger çend rêgez bête cîbicîkirin, metirsîya enfeksîyonê kêm e. Berî her tiştî, di nav van da, tedbîr bête girtin ku xwe ji têkîlîya bi xwîna kesên bîyanî û têkîlîya xwîn bi xwînê ra pêk neyê:

- Di dema bikaranîna madeyên hişbir da, divê derzî, lûle û tiştên din neyên parvekirin.
- Piştrast bin ku stûdyoya deq û pirsing çêkirinê, stûdyoya neynûk çêkirinê û kuaforê ku we bijartîye, di bin şert û mercên zext ên hîjyenîk da dixebite.
- Dema metirsî hebe, ku bi têkilîyê xwînê ra rasterast wê pêkbe, divê hingê di têkilîya zayendî da prezervatîv bête bikaranîn.
- Bi taybetî di pîşeyên tendûristîyê da – ji bo kêmkirina metirsîya xwînê û birînên derzîyê, lepikên parastinê bi kar bînin.

Teşxîs û derfetên testê

Divê kî bête test kirin?

- Kesên ku beşek ji jîyana xwe li herêmên cîhanê jîyane, ku li wir hepatît C zêde belav bûne. Ev, wek mînak: Ewrupaya Rojhilat, herêma Rojhilata Deryaya Navîn, Afrîka an jî Asya Navîn û Asya Rojhilat.
- Kesên ku heta niha deq an jî pirsing çêkirine û ne bawer in, ku ew di bin şert û mercên sterîl da çêbûye. Mînak: Di girtîgehê da an jî li devereke cîhanê ku nikaribûn vê yekê binirxînin.
- Mirovên ku têkilîyên xurt bi kesên bi hepatît C ra hebin.
- Kesên ku heta niha madeyên hişbir bikaranîne an jî ji bêfilê kişandine (lûle bi pozê xwe kirîne), an jî bi destê kesekî din heta niha hatibin enjekte kirinê. Mirov gelek caran wana bîrnayîne an jî hez nakin, bi taybetî tenê kêm caran an jî mêj ve bikaranîbin.
  Ji ber hebûna hepatît C bi mada hişbir ra, gelek caran mirovên mexdûr, ji ber metirsîya marjînalbûyînê an jî cudakarîyê naxwazin ku sedema testê aşkera bikin. Divê vê yeke ra rêz bête girtin.
- Kesên ku bi şevba HIV'ê pêketine an jî hevkarên zayendî diguhezînin.
- Kesên ku li girtîgehan kar dikin, ji ber ku li vir gelek derfetên enfeksîyonê hene.
- Mirovên ku berîya hilberên veguhastinek xwînê wergirtine, ji bo hepatît C, bi awayeke rûtîn hatine test kirin (li Almanyayê, ji sala 1991ê pê ve).

Baştir e bête zanin:

Enfeksîyona saxbûyî ya bi şevba (virûsa) hepatît C, dijî nûvegirtinê parastinek bi bandor nîn e!

Di derbarê testê da divê ez çi bizanibim?

Ji bo ku hepatît C bi awayekî zelal bête dîyarkirin, rêbazên cuda yên testê hene. Testek dikare piştî ragihandina gengaz bi qasî şeş hefteyan enfeksîyonê tespît bike.

Testa antîkorê: Testa antîkorê ya hepatît C'yê dîyar dike, gelo ew kes heta niha bi enfeksîyona hepatît C'yê pêketîye an na. Ger testa antîkorê neyînî be, wê demê ew kes, di jîyana xwe da bi hepatît C'yê pêneketîye.
Her çend enfeksîyon nû pêk hatibe jî, test dîsa jî dikare neyînî be.
Ger testa antîkorê erênî be, wê hingê ew kes an di heyamek jîyanê da bi serfirazî ji hepatît C xelas bûye, an jî hîn bi awayeke kronîk pêketîye. Paşê ev yek, bi testek PCR ve têtе zelal kirin.

Testa PCR: Testa PCR ya hepatît C, nîşan dide ku madeya genetîkî ya şevbayê, niha di xwînê da heye an na, gelo şevba hê jî zêde dibe an na.
Ger testa PCR negatîf be, her çend testa antîkorê erênî bû jî, wê hingê hepatît C pak bûye. Wê hingê mirov nikare şevbayê bi kesên din veguhezîne.
Ger testa PCR erênî be, wê hingê hepatît C hîn çalak e û dikare bête tedawî kirin.

Testa hepatît C dikare li muayenexana bijîşkan, li daîra tendûristîyê, li hin nuqteyên kontrolê yên AIDS û navendên din ên şêwirmendîyê têtе kirin. Dema ku cîhê testê digerin, daîra tendûristîyê, die Leberhilfe e. V. û Deutsche Aidshilfe e. V. dibin alîkar.

Bi gelemperî, bîmeya tendûristîyê mesrefên testa hepatît C digre ser xwe. Lêpirsîn bi piranî nenas in (bi nav nakin). Bi tenê daîreya tendûristîyê ya herêmî ji ber berpirsîyarîya raporkirinê neçar e ku daneyên kesane werbigre. Wekî din, kesek nikare li ser encama testê agahdarîyan werbigre.

Pêşandana belaş ya hepatit, di kontrola tendûristîyê da

Ji payîza 2021'an vir ve, pêşandana giştî ya hepatît B û C ya gelemperî, beşek ji pêşandana pêşîlêgirtinê ye, ji bo mezinan (berê wekî "Check-Up 35" dihat zanîn).
Hemû kesên xwedî bîmeya tendûristîyê ya zagonî ne, dikarin di çarçoveya vê kontrolê da carekê bêpere testa hepatît B û C çêbikin. Wekî din, rewşa perpûnlêdana hepatît B têtе kontrol kirin û ger pêwîst bike, perpûnlêdan têtе pêşnîyar kirin.
Heya niha li dijî hepatît C, perpûn nehatîye destnîşan kirin.

Ger muayeneya dawîn di navbera 2018 û 2020an da pêk hatibe, kesên bîmekirî yên temen ji 35 salî mezintir, dikarin testa hepatît B û C ya ku nû hatî destnîşan kirin, werbigirin.



Tedawîya hepatît C

Armanca tedawîya hepatît C ew e, ku şevba (virûsa) bi awayekî domdarî ji laş bête derxistin. Heta çend sal berê, car caran tedawî ji salekê zêdetir dom dikir û piranîya nexweşan, neçar dibûn ku hin bandorên giran bikşînin.

Niha bi saya dermanên nûjen û baş ya tehamulkirî, şansê pakbûna hepatît C, ji %95 zêdetir e. Derman, bi gelemperî wekî tabletan, di heyamek rêvebirinê ya 8 û 12 hefteyan da têtе girtin.
Tedawî, dibe alîkar ku kesên ku bandor li wan bûye, xwe bi awayeke rehet hîs bikin û ji nexweşîyên duwemîn yên hepatît C, dûr bikevin.

Kesên ku tedawîya ne serketî li pişt xwe hîştine, dermanên nû, şansên başbûnê pêşkêş dikin.
Kesên ku alkol vedixwin an mada hişbir bi kar tînin, tedawîya şûna narkotîkê werdigirin, bi HIV'ê ra dijîn, nexweşîya gurçikê yan jî sîroza kezebê heye, dikarin îro baş bêtin tedawîkirin.

Çîrokek kesane

Bijîşk, li cem jineke temen 75 salî, nirxên kezebê bilind dibîne. Ew, di gel tiştên din, testa hepatît C pêşnîyar dike.
Jinik, bi matmayî dimîne. Bi hêrs, ew protesto dike ku wê qet mada hişbir bi kar neanîye.
Bijîşk jê ra dîyar dike, ku hepatît C, berîya sala 1991ê jî bi rêyên xwînê derbas dibû.

Ew dibêje, ku ev tişt qet çênebûye. Lê belê, di axaftinek din da derdikeve holê, ku ew di sala 1975an da, pîştî welidandina bi sezeryan, bi "zerikê" ketîye.
Bijîşk jê ra dîyar dike, dibe ku di dema welidandinê da, bêyî ku jê ra bête gotin, xwîn hatîya veguhastin.

Testên antîkor û PCR erênî nin. Li cem wê, hepatît C ya kronîk heye. Pîştî tedawî kirinê, testa wê ya PCR dîsa neyînî ye û nirxên kezeba wê vedigerin asta normal.



Agahdarîyên din û alîkarî

Daîra tendûristîyê ya li cîhê rûniştina we, agahdarî û pîştgirîyê pêşkêş dike. Hûn dikarin jimareya têlefonê ya beşa tendûristîya xwe ya giştî, li vir bibînin:
www.rki.de/mein-gesundheitsamt

Deutsche Leberhilfe e. V. agahdarî û şîretên navendî li ser nexweşîyên kezebê, li ser online testek kezebê û navnîşanek berfireh ya klînîkan, muayenexaneyên pisporan, navendên şêwirmendîyê û komên bi xwe xwe alîkarîyê li ser malpera www.leberhilfe.org pêşkêş dike
E-Mail: info@leberhilfe.de

Li ser malpera Deutschen Aidshilfe e. V. gelek agahdarî, her weha şêwirmendîyan pêşkêş dike:
www.aidshilfe.de/hepatitis
Şêwirmendî, bi rêya mail û chat:
www.aidshilfe-beratung.de

Berpirsîyarîya belavokê

Weşanger
Navenda Tibbê ya Etnikî e. V. (EMZ)
Königstraße 6, 30175 Hannover | Almanya

Redaksîyon û kalîta pisporîyê
Matthias Wentzlaff-Eggebert, Ramazan Salman,
Michael Kopel, Elena Kromm-Kostjuk, Komm.Passion

Dema çapkirinê: 2022

Mîzanpaj: eindruck.net, 30175 Hannover

Wêneya bergê: iStock.com/Rawpixel

çavkanîyên wêneyê: ▸6 © ag visuell/stock.adobe.com | ▸9 fizkes © 123RF.com | ▸13 yacobchuk © 123RF.com

Derfetên xwestinê
Daxwaz bi-Online: www.stophep.info
E-Mail: bestellportal@ethnomed.com | salman@ethnomed.com
Broşûrên çapbûyî, dikarin li ser navnîşana jêrîn daxwaz bikin:
Ethno-Medizinisches Zentrum e. V.,
Königstraße 6, 30175 Hannover

Di zimanên cuda cuda da peyda dibe

Bi alîkarîya:

Weşanên din yên EMZ bi download û li ser navnîşana jêrîn daxwaz bikin:
www.mimi-bestellportal.de

Jêderên-URL: Ji bo naveroka malperên derveyî yê ku li vir hatine weşandin, xwedîyê malperan bi xwe berpirsîyar in.

DE-V-HCV-220045-KU